

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 123)* *Sal 21* *Rezber 2016 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


## Em Ne ``Gelê Vebjartî `` Ne!!

**Desteya sernivîser**

Ne tenê siyasetmedar, lê kilekorên Kurdan jî nas kirine, ku doza gelê Kurd li seranserî Kurdistanê di kîjan pêvajoyê û di demeke çiqas dîrokî re derbas dibe.

Roja îro, bi saya berxwedana dûrûdirêj û berdewam, derfetên zêrîn ji bo rizgariya gelê Kurd peyda bûne. Li seranserî gerdûna şaristanî û pêşketî, navûdengê Kurd û Kurdistanê bi rindî û mafdariyê tê hildan, û bi serefirazî li ser zimanan digere. Ango bingehek xurt û hêvîbar ji bo nasîna rastî û mafdariya gelê Kurd peyda û ava bûye. Bê guman, ev jî bi saya canebexşa(fidaî) bi sed hezaran pakrewan, û dîrokeke ji êş û êşgihandina hutase(haêl) , û têkoşîna bêhempa li hember neyarên wekhevî û azadiyê hatiye damezrandin.

Lê digel vê rastiya berçav û diyar, pirseke giring heye, ji ser zimanên gelê me û xêrxwazên wî danakeve; pirsiyar dibêjin: Ma Kurd bi xwe, wek gel, partî, rêber û rêvebirî, li gora giranî û giringiya vê pêvajoya derfetbar in? Di nava xwe de amade ne, ku ``istiriyê xwe bi destê xwe derxin``?.

Berê, derd û kulên me ji bin serê hizr û sinciyên hozîtî, êlperestî, derbegîtî û nezaniyê bû, ew li pêş me dibûn kelem û neyarê me yê herî no(şerês). Lê wek xuya dibe, ku bermayên wan hizr û sinciyan di hişê me de zindî ne, û ne mirine, bi temamî têk ne çûne û hîn jî hikardar in; Xwe di bin patinê(cild) û hundir qafê me de veşartine, û roja îro di reftara(silûk) ..........

❷

## Keça Kurd Nedye Mûrad, Balyoza Niyaza Pak



Li roja 3.8.2014an, hêzên çeteyê têror ku bi DAIŞ têne nasîn, derbas navça û bajarê Şengalê bûn, û kiryarên hovane bi xelkê me yê Êzdî kirin. Di encamê de bi hezaran jin, mêr û zarok hatin kuştin, û bi hezaran keçikên biçûk û mezin û jin revandin, û wek (carî û sebiye) birin û daxistin bazaran. .................

❻

## Komeke nû ji Asayîşa perwerdekirî

Li Herêma Efrînê, li roja Înê 23-9- 2016an, piştî du mehan ji perwerdeya leşkerî û siyasî, komeke ji 45 asayîşên jin û mêr derçûn û bawername standin. Rêwresma derçûnê bi sirûda ((Ey Reqîb)) dest pê kir. Pişt re, gotin hatin kirin, û rola hêza asayîşê di parastina aramî û hêminiya herêmê de anîn ber çavan. Û hate tekezekirin, ku ewê li gel Yekineyên Parastinê, ewlehiya herêmê ji çeteyên têror, ku çavên wan li wêrankirina navçê ne, biparêzin.

## Pêşengeha Pepûlekên Hunermend

Efrîn- Li roja 25a miha Rezberê, di bin navnîşan ((bi pêçiyên pepûleyên Efrînê, tabloya azadiyê gul vedide)), rêxistina jinê ya Partiya Yekîtî Ya Demokrat A Kurd li Sûryê, pêşengeheke hunerî ye wênekêşiyê ji zarokan re li navenda partiyê li dar xist. Bîst û çar zarokê hunermend bi 150 ..........

❻

# Di jîyana mirovatîyê da, ziman amraz û haceteki herî girîng e

## Hevpeyvîn bi wêjevanê Kurd RIZA ÇOLPANÊ DÊRSIMÎ re

✍ Newafê Bişar


*__Riza Çolpan__(Rizoyê Dêrsimî) yek ji helbestvan, romanivîs û nivîskarên Kurd ên navdar e, ku ji ber xebat û têkoşîna rêzanî ve neçar bûye ku beriya 50 salî, welatê xwe* ***Kurdistan*** *li şûn xwe bihêle û derbeder bibe, û li kişwera* ***Aoustralya****, bajarê, Sydney digel malbata xwe cîwar bibe.*

*Di wan 50 salên borî de, tevî ku* ***Rizoyê Dêrsimî*** *bi laş û gewdê xwe li mişextiyê dijî, lê dil, hiş û ramana wî li Kurdistanê mane, her û her ew bi hesreta dîtina welatê bav û kalan maye û hê jî di wan xewnan de dijî.*

*Beriya 15 salan, rêzdar* ***Rizo*** *li welêt bû mêvan, dostanî, hevaltî û hezkirineke mezin di navbera me de ava bû. Ji nêz ve me hev nas kir, hê jî hezkirin û dostaniya me berdwam e. Ji wê rojê û vir de, her ku bobelatek bi ser Qamişlo yan deverên Kurdî li Sûriyê de tê, bi dengê xwe yê zîz, kelogirî, ew pirsa me û hemû Kurdan dike. Di komkujiya Qamişlo a terorist de, cara dawî bû ku min dengê wî bihîstiye.*

*Di warê nivîsandina bi zimanê Kurdî de,* ***Rizoyê Dêrsimî*** *gelek berhem di beşê Helbest, Roman û gotarê de nivîsandine, ji bilî berhemên bi zimanê Tirkî.*

*Bi navê Weşana me NEWROZ, ez xêrhatina mêvanê we birêz* ***Rizoyê Dêrsimî*** *dikim, û dixwazim em bi hev re xweşmêrê peyv û pênûsê ji nêzîk ve nas bikin. Ji ber vê hindê jî pirsa me ya pêşîn ev e:*



N-B :***Riza Çolpanê Dêrsimî*** *kî ye, ew çawa xwe bi xwendevanên NEWROZê dide nasîn?.*

**Riza Çolpanê Dersimî**: Belê, berî ku ez bersîva vê pirsa te birayê xwe bidim, dixwazim ji hemû xwendevanên rojname ya **Newroz**, berpirsîyar û rêvebirên vê rojname ya Kurdistanî ra li welatekî herî dûr, Cemsera Başûrê Cîhan, Kîşwera nav Awistûralya, bajarekî herî bedew li Sydney: "Dema we bi xêr, roj baş xuşk û birayên delal, silavên biratî ji we hemûyan ra. Hêvî dikim hûn hemû baş bin û di benda sazûmanek mirova î li wî parçeyê biçûk, Kurdistanek Azad û Serbixwe, ne wekî ….

9

---

### Em Ne … Dûmahîk

ezîtiya partîtiyê û mirûdîtiya nezanan, serê xwe hildidin û karê xwe bi giranî dikin.

Kîjan bêhişa kane gelê xwe bide bawerkirin, û bêje ku partiyek yan aliyekî siyasî bi tena xwe, kane gemiyeke wilo biçûk, ji nava gewrederyaya gurgîn û gergerîna ku li Rojhilata Navîn digere, biparêze û serkeftî bigihîne ber kendava azadiyê.

Di rewşa gelê Kurd de, nemaze jî roja îro, tiştên bingehî ji rêvebirên dozê re zor pêwîst in. Zor pêwîst e Kurd haydar bin, baweriya tekûz bi tu dewlet û hêzên ne kurdî nekin, û li aliyê din, hewil bidin, ku baweriya jidil di navbera hêz, partî û qadên gel xwe de peyda û ava bikin û biçînin.

Eger îro ``ba li bêdera me hatiye``, gerek e em jî bi qaserî barê xwe bin; çinkî ew tim ji me re lê ne tê û namîne jî. Bila em hîç ne li bendê bin, ku xelk pariyan amade bike û têxe devê me. Rewşên cihanê ne yên berî sed salî ne, û pir hatine guhertin, lê bila em baş zani bin jî, ku em li ba Emerîka an Rûsiya û bilî wan jî ne ``gelê vebjartîne``, tirsa mezin ew e, ku dîsa dîrok dubare bibe, û gava karê wan bi me bidawî bibe, me û doza gelê me bavêjin ber devên guran û kesek li me xwedî dernekvin.

Loma jî, gava despêkê, pir giring û pêwîst ew e, ku berjewendiya gel û welêt li pêş partî, rêbertî, hozîtî, malbatî û hertiştekî bê danîn; û hemî partî, alî û nofên gel di xebat û biryarên stratîcî de beşdar bin û di ber de berpirsiyar bin, yan jî emê herdem, di welatê xwe de bêçare û li ber deriyê xelkê bin, û ji qedera xwe ya ku em bi destê xwe reş dikin, gazinan nekin.

Nêrîna Azad

# Doseya Sûriyê bi giştî û ya kurdî bi taybetî

# Û Bazara aşkere ya navdewletî

Memê Alan

Îro roj, piraniya doseyên çaresernekirî ku li dunyayê hene, hêzên navdewletî û li serê wan her du dewletên mezin Emerîka û Rûsiya bi doseya Sûriyê ve girêdayî ne, her aliyek ji wan tenê li debara serê xwe digere, û wê çawa berjewendiyên xwe li Sûriyê pêk wîne, û çareserkirina kirîza Sûriyê û pirsa kurdî jî li ba wan bûye qisaweta herî dawiyê. Jixwe, di vî warî de, Encûmena Ewlehî ya Navdewletî û Komela Netewên Yegirtî bêçare û desgirêdayî mane, û tenê li hewildanên Rûsiya û Emrîka mêze dikin, ka wê bi kû ve bajon.

Ew her du dewletên serpereşt jî çiqas gerek hev in, ewqas jî di pir aliyan de dijberî hev in. Rûsiya derbas Sûriyê bû, da ku him cihekî ji xwe re di ava germ û Rojhilata Navîn de bibîne, û him jî piştgiriya hevalbendên xwe li Sûriyê û herêmê ( rijîm, Îran… û H.W.D) bike, û ne bi nêta ku sibe bikşê, her weha çiqas derfet hebe, kanibe ji doseyên ne çareserkirî bi Emerîka re sûdê wergire. Emerîka jî weke dewleteke mezin, ne kêmtirî wê dixaze berjewendiyên xwe pêk bîne û dostên xwe yên herêmî ta radeyekê ji xwe neqherîne û razî bike .

Vêca vê tevlîhevbûna berjewendiyên ne wek hev, hîşt ku



“ Hilweşandina bajarê Heleb “

her here kirîza Sûriyê aloztir û zehmetir bibe û roj bi roj guherîn têkevin nexşeriya çareseriya ku li ser kar dikin. Li dema niha tenê di şerê li dijî terorê de li hev kirine, lê di binavkirina hêzên teror û ne teror de hîn li hev nekirine, tiştê din çi gilgemar û şer di Sûriyê de hebû hin bi hin di bakurê Sûriyê de hate komkirin, ji Ezaz ta Cerablusê bi ferehiya 10-15 km an kêm zêde radestî Turkiyê bû, li hemberê paytext (şam)ji hêzên rikber ên Islamî ên radîkal were valakirin û radestî rijîmê bibe, û cihek jê re li Helebê jî hebe.

Em jî wek Kurd berjewendiya me jî di karîdorekê di navbera Efrîn û Kobaniyê de heye, ev yeka jî li heza pir aliyên hevrikiyê nehat, ji alîkî ve Turkiyê xwest û hîn jî dixwaze ta Babê here, û bandora xwe bi awakî çalak li Helebê jî bike û Kurd jî li vê deverê tune bin, rijîm jî dixwaze Helebê û derdorê bi dest xwe xîne, Amerîka jî naxwaze ta niha hêzên teror û ne teror li gor lihevkirina wê û Rûsiya ji hev derxe, ji ber ku tev dizanin ew yeka tê wateya ku rikberiya nermerê mutedêl nemîne), wê yekê û gelek sedemên din jî hîştin ku agirbesta Kêrî-Lavrof têk biçe, pelên dûzankirî li nav hev kevin û ji nû ve şer bi awakî tundtir dest pê bike .

Li pêş vê tabloya siyasî ya ku heye, em van navnîşanan gengaz dibînin.Li Helebê û bakurê Sûriyê asta xwînherkandin û pevçûnên dijwar wê ji berê bêtir bibe. Piştgiriya Yekîneyên Parastina Gel Y.P.G ûY.P.J û hêzên Sûriya demokratîk Q.S.D di şerê li hember Da`işê de, her weha rêdûzana li pêş Rêvebiriya Xweser, di gel parastinek asîmanî ji herêmên kurdî re wê berdewam be . Vekirina kerîdora di navêna Efrîn û Kobaniyê de û parastina wê – ger çêbibe- hîn ne diyar e û nakokî li ser wê ta ..

5

# Golikek navî naxirekê pîs dike

Dr. Mihamed Zeyno

Di van du sê heftiyên dawî de, pirê caran esayişa Almaniya hin xortên sûrî bin çav kirin û ew bi sûcê têkliyên bi dezgehên tundrew tewanbar kirin... Di medya Almaniya de vê çalakiya polisan deng veda û raya giştî mijûl kir û bû cihê gengeşan ji jêr ta jor. Hemû dezgeh û partiyan, çi di perlemento de û çi li derveyî wê, ev bûyer şirove kirin. Ev girtina van xortan bû babeta sereke di kar û xebata siyaseta Almaniya de. Helbet zimanê dijber û rikberiyê dirêj bû û wê hêrişeke tund dane ser siyaseta hikumatê û ew rezîl û riswa kirin, ew dibêjin: Binêrin!, çiqas têtorîst bûne cîranên me. Ev hevok milet bi tirs û sawê dixîn e, ew piştgiriya gel ji bo xwedîkirin û pêşwazîkirina penaberan sist û lewaz dike.

Li gor ragihandina karmendên ewlekariyê, meha Tebaxê 154 caran xwediyê rihan bi navê alîkarî û yarmetiyan, nimêja bi hev re di roja înê de, di 55 kampan de saz kirine. Di meha Êlonê de ev çalakî kêm bûye û gihêşte rêjeya 54 caran. Dema milet dibîne ku bi sedan xort li kolanan li pey hev rawestîne û merasîma nimêja înê dikin, û melayek di serî de radibe û xwe qiloç dike, û bang dike û daxweza têkçûna kafiran dike, û bi sedan deng bilind diqêrin Elah û ekber,



wê gavê milet şaş dibe, gelo kî hewandin e? Ev çi kesin û daxwaza wêran kirina me dikin.?. Tiştê din, wek kesekî tevgera civakê ji nêzîk ve di şopîn e, pirê xortên me rihên xwe dirêj dikin û dûzan dikin... Gelek ji xortên Ereban cil û bergên "Efganan" li xwe dikin. Pir jin û xanimên Ereban manto û cilên rengereş li xwe dikin û ser rûyên xwe bi temamî digirin, an tenê çavên xwe xuya dikin. Di pirê malan de wêneyên ayatan hatine nivîsandin û dalaqandin. Bi gotinê be, penaberan çanda xwe ya li welêt bi xwe re gihandin van welatan. Ev jî proseseke normale, ji ber ku mirov weha bi lez ji çanda xwe dûr nakeva. Wek cawa Kurd dibêjin ``Giya li ser koka xwe şîn dibe``. Mirov jî di demeke kin de ji `urf û `adatên xwe dûr nabe. Bi hatina Ewropa ew nabe yekî din, bi taybetî dema dibîne, ku oldar riya wan vedikin li pêş wan radiwestin û bi navê "parastina" gel berê wan didin mizkeftan û li ber wan dixwînin.

Li gor min hîn jî xortên me ji şok û kambaxiya şerê li welêt rizgar ne bûne. Di vir de axaftina dê û bavan roleke ne baş dilîze. Dema xort dibihîse, ku bav rojê deh caran dibêje: Ev der ne welatê me ye... Emê di demeke kin de vegerin welêt. Wê gavê xort dirame.... Gelo çima ezê bixwînim madam emê piştî salekê an du salan vegerin. Ev fikra vegerê rê li ber pêşveçûna xortan digire, wan bê armanc dike; germiya wan sar dike. Berê xortan dide aliyê lîstik û seyranê. Ji ber hindê ta niha girseya xortên me nikanin bi hêsanî cihê xwe di cavaka Ewropa de bigirin. Ez bi hêvî me ji malbatên me li welêt... Berî hûn bên van welatan sed carî bifikirin.... Wêneyên ciwan ku xizmên we bo we rêdikin tenê xewn e û ne jiyana rasteqîne ye

# Rexne pêşvebirin û pêşxistin e

Nazdar Hesen

Bê gûman, her mirovek nêrîn, helwest û ramanên xwe cuda hene.

Dema ku mirov di civakê de helwest û nêrînên xwe diyar dike, ew rastî pir têbîn û rexnên rast an şaş tê, lê mixabin, bêyî mirov têbigihe, ew bertekeke neynî jê dibe, û dibe sedema nakokiyê, û jihevkirinê, eger rexn dubare bibe, pir caran, ew bi xwe re tova kîndariyê û qerezê peyda û belav dike .

Bi rastî pir mirov, civak, partî, sazî û h.w.d, zû bi zû yan bi hêsanî, rexnan li ser kar û helwestên xwe napejirînin .

Ji ber ku, ta niha em têneghiştine têgeha rexnê, yan armanc jê çi ye???

Yan çima rexn pêwîst e ku bibe bendek ji sîstema jiyana me???

A rast, divê rexn ne cihê qerez û nakokiyan de be, ta ew ne be jêdera werezkirinê, lê belê, ew bi singekî fere were pêşwazîkirin, û ew bibe cihê rêzgirtinê û lihevkirinê.

Dema ku em rexnan dipejirînin, ew ne lawazbûneke, lê ew bi xwe gaveke bi hêz û wêrek e, û ta em armanceke baş ji rexnan wergirin, divê armanca wê ya sereke, şaşîtî û kêmkasiyên her karekî dirust bike, û di pêşerojê de werin çareserkirin, û nehêle, ew dibare bibe, ji ber vê rola wê ji bo pêşvebirin û pêşxistina civakê, dê roleke mezin bilîze.

Da ku em bighêjin vê astê, divê di çanda me de benda herî bikêr û sûd rexn be, û ji bo wê guhêrtineke ramyarî çêbibe, û her mirovek ji kesayetiya xwe de dest pê bike.

## Ji hovîtiya Tirkên Nijadperest

Li roja 30 miha Rezberê, gava ku du malbatên Kurd ji Gundê Me`mila-Reco-Efrîn, dixwastin sînor derbas bikin, leşkerên artêşa Tirk li ser sînor, li nêzîk gundê Sorkê, ew dane ber fîşekên xwe, û keça şeş salî Rûhêv keça Ferzend şehîd kirin, û dê bavên wê jî birîndar kirin. Pişt re, ew her du li gel pênc kesên din ku vê re bûn, girtin, û hemî birin dever (Bab El Hewa) li parêzgeha Idlibê û radestî çekdarên Cebhet El Nûsre kirin.

Di van çend salên qeyran Sûryê de, bi sedan mirovên sîvîl ku hewldidin derbas Tirkiyê bibin, toşî hovîtiya pasewanên sînor û leşkerên Tirk dibin, bi dehan ji wan hatin kuştin û bi sedan jî birîndar bûn. Lê mixabin ne yek jî ji rêxistinên navdewletî û mavên mirovan ji bo van kiriyarên çepel dengê xwe dike, ne jî çarekê ji vê hovîtiyê re dibîne. Banga me ji xelkê me ew e, em li mal û gundên xwe bimînin, jê dernekevin, berê xwe nedin sînor û welatan û xwe nexin bin metirsiyê û kuştinê.

**Bila serê xwedî û malbata Rûhêvê xweş be, û çakbûn û rizgarî ji dê, bav û hevalên wan re.**

**Doseya Sûriyê … Dûmahîk**

demekê wê hebe. Û Kurd li Rojavayê Kurdistanê wê ji berê bêtir ji aliyê Turkiyê, hevalbendên wê ji hêzên radîkal ên Islamî siyasî û rijîmê ve wê rastî armanckirinên tuntir werin.

Li hember van metirsiyên ku li pêş welatê me Sûriyê bi tevayî û gelê Kurd û deverên wî bi taybetî, erkên rasteqîn bi me divên. Ji alîkî ve, ji tevaya Tevgera siyasî ya Kurd ( Tev-Dem, Hevbendî, Enkese û yên dervayî hersê navnîşanan) tê xwastin, ku dev ji nakokiyên xwe yên curbecur (kesayetî, partîtî..) berdin, û li ser masakê, kêm-zêde yekrêziya xwe pêk bînin , da ku kanibin li pêş van metirsiyan rawestin û çarakê ji pirsa Kurd re bi hev re dînin , û her weha roleke aktîv di çareserkirina kirîza Sûriyê de jî bilîzin. Ger ev yeka ne gengaz be jî , destpêkê ji aliyên nêzî hev de dest pê bibe. Çimkî hinek hene cihên ku ji xwe re vebjartine, ne di berjewendiyên kurdayetiyê de ye, hêvî ew e, ku rojekê pêş de helwesteke wêrek bistînin û vegerin nav refê xwe û rê li pêş danheva mala kurdî hêsan bikin.

Her weha di vî warî de, ji Rêvebiriya Xweser jî tê xwestin hinekî ji ya tenêtiyê dakeve. Li aliyê din , ji hemû pêkhateyên Sûriyê (Ereb, Kurd, Asûr, File..) tê xwestin dev ji nakokiyên olî, bineolî û netewî berdin û berê xwe bidin hev, kabikan li paş xêrnexwazên Sûriyê navêjin, û bi hev re li çarakê bigerin û pêşeroja welatê xwe zelal bikin, dewleteke, demoqrat, pirereng nenavendî û mafên hemî pêkaheteyên netewî û olî li gor peyman û belgeyên navnetewî tê de parastî bin. Yan jî li şûna vê, wê di Sûriyê û herêmê de tim nebawerî, nearamî û neaştî li dar be, û wê her tim tolhildan, kuştin û tarûmarkirin be, yanê bibe welatê tevlihevî û bêzagoniyê .

**Pêşengeha ...Dûmahîk**

tabloyî di pêşengehê de beşdar bûn. Ev destxiraweke baş û hêja ye ku rêxistina jina pê radibe. Pir pêwîst û giring e, ku di van demên teng û dijwar de em li zarokên xwe xwedî derkevin, behrekên wan nas bikin, û deriyê dahêniyê li ber wan rast û serast bikin, û wan pesend bikin.

Li gora hunermendê payebilind rêzdar Eslan Me`mo, gelek tabloyên hêja û xweşik bi destên biçûk û nazik hatine nexşekirin, û hêviya pêşdeçûn û geşepêdanê li ba gelekan ji wan pir bilind e. Li gora asteya hunerî ya tabloyan, hurmend Eslan sê tabloyên herî baş ji nav tabloyan vebjart, û xwediyên wan, wê ji hêla komîta amadekirina pêşengehê ve werin xelatkirin, ew jî ev bûn: Şîrav Mihemed Îse (17 salî), Xoşyar Selah Ehmed



(13 salî) û Can Ebdo Îbrahîm (11 salî). Serkevtin ji bo kulîkên me, û spasî ji rêxistina jinê ya PYDKs û hunermend Eslan Me`mo re.

**Keça Kurd … Dûmahîk**

Ew kiryar û babelata mezin, birîneke kûr di dîroka Kurdî, û dilê hemî kurdekî de vekir, ku zû netê hev.

Keça kurd a Êzdî Nadiya Mûrad Besê Taha jî yek ji wan keçikên ku keti bûn ber destên Îslamên têror bû. Piştî ku şeş bira û diya Nedye hatin kuştin, ew dîl hate birin, û wek (sebiye) hate bikaranînin. Lê piştî demekê, ew ji destê çeteyên têror hate rizgar kirin, û pişt re, hin saziyên navnetewî ew ji bo dermankirinê gihandin dewleta Almaniya, û wê jî tiştê ku bi serê wê hati bû, ji raya cîhanî re hewalda û rûreşîtiya Îslama siyasî riswa kir.

Nediyeyê bi wê ne kir, ew li gelek welatan jî gerî û pirsa xwe û jinên Êzdî ku hati bûn revandin, ji raya giştî re da nasîn. Ew çû Misir, Kiwêt, Yûnan û bi serokên wan re rûnişt, û çû seredana gelek dewletên din jî. Di civîneke Encûmena Ewlehî ya Navnetewî de jî amade bû, û rewşa xwe û jinên revandî ji wan re diyar kir. Nedye li ser gelek alavên ragihandinê jî derket û guhdaneke mezin bi pirsa wê bi taybetî, û bi pirsa jinên ku ketine destê DAIŞê hate kirin.

Ji ber wê yekê, li sala 2016an, Nedye wek berendam ji bo wergirtian Xelata Nobilê a Aştiyê hate pêşniyarkirin, û wek sembol ji êşgihandina jinên Kurdên Êzdî re hate naskirin.

Li roja 17.9.2016an, Yekîtiya Netewan biryar da, û Nedye mîna ``balyoza niyaza pak ya Y.N li dijî hişbir û sûckariyê`` bi nav kir. Li gor stubariya wê ya nû, Nediye wê di warê qaçakirina mirov, jin, keçik û penaberan de çalakiyan bike, piştgiriya destxirawên (mûbadere) di wî warî de û berevaniyê di ber de bike.

Hêjayê gotinê ye, ku di payedarkirina Nedye de, Ban Kî Mon sekretêrê Y.N, û Semente Pawir baliyoza Emerîka li Y.N û gelek kesatiyên din jî amade bûn.

Nediye li sala 1993an li gundê Goçer ji qeza Şengalê ji dayîk bûye.

Serkeftin ji keça Kurd Nadye re, û rizgarî û azadî ji hemî kesên Êzdî û bilî wan jî ji nav destên DAIŞa ``sertêror`` û hemkarên wê.

**Rojî Kurd … Dûmahîk**

*Xwendin Xebat*
*Her nefsê Kurd îro cavê xwe lazim vekî*
*Diz hat gihişt neqebê tedbîra xwe şêbikî*
*Dev vekirîne gura dikin me wenda bikin*
*Hêlekî cehlê me hem Ewrûpa hêlekî*
*Hîn nebes ma ra xewnê xefletê pîsî*
*Dawî li me neçûye guh bidinê kelîmekî*
*Tedbîra xwe çêbikin hewesê bikin dil bikin*
*Mekteb li her cî vekin xwendin bidin sêlekî*
*Rabin ser xwe carek dişmin gişk xelqedor*
*Civiyan li ser me tev da bixapînin carekî*
*Mebin feqîrê dewletê tevda bikin xîretê*
*Xwe hilkêşînê xefletê her cî Eşîrî bikin yekî*
*Xwendina me rast bikin çê xerab nas bikin*
*Her şuxle derbaz bikin çê bikî xwendin bikî*
*Mekteb li gunda vekin zaroyan xwendin bidin*
*Cot bikin her kar bikin gişk li qezenc meyzekî*

Xelek 1

# Ji dîroka kurdî ... Kesayetî û helwest

## Şah Deyako Damezrênerê şahnişîna Med

Dr. Ehmed Xelîl
Werger: Heyder Omer

**Rewşa Mîdan:**

Med pêşiyên Kurdan e, ew ji şeş êlan pêk hatibûn. Herodotus dibêje; ew êlan ev bûn (Bossî, Parîtasîn, Sturokatî, Erîzantî, Bodî û Magî). Rast e, ku zimanê medî di nav êlên wan de hevbeş bû, lê wan nakokiyên êlî jî hebûn, û di heman demê de, şahnişîna Aşûr dest dabû ser wan, û carcaran ew talan dikirin, û komkujî pêk dihanîn, û dîl dikirin kole, û her der kavil dikirin. Med têgihêştin, ku bi vê şerpezebûnê nikanin li hember împeretoriya Aşûr rû bi rû bibin, û tenê hevgirtin riya rizgariyê ye.

Rêvebirekî pendiyar û wêrek di nav wan de diyar bû, navê wî Deyako /Daiku kurê Feraort / Phraort bû. Ew bi Deyoko û Dehyako jî dihate navandain, û di jêderên Farisan de bi Keyqubad, û di hin jêderên Yonanan de bi Diyosîs /Dioces jî tê navandin. Werin em guh bidin Herodotus, ka li ser vî pêşewayî çi dibêje: Med di gundên ji hev dûr de dijiyan, û wan desthilata navend tunebû, tevlihevî di nav wan de, û sitem li ser wan giran bû. Mirovek ji gundekî Medan diyar bû, nave wî Deyako kurê Feraort bû, gelek pendiyar bû, û dixwast bibe pêşewayê miletê xwe, ewî bawer kiribû, ku dadmendî û sitem hevdij in, û bi carekê lihev nakin, belê nakokiya wan herheyî ye. Rabû pilanek gerand, û dadmendî bi hewesdarî li nav êla xwe pêk hanî. Navdariya Deyako: Deyako banga dadmendiyê hilda, pêre jî xelkê guh dan şêwra wî, û pê hay bûn, ku boçûnên wî pendî ne, biryarên wê dadmendî ne, û ji bo careserkirina nakokiyên xwe her diçûn ba wî, da çareser bike, û ji ber ku ewî dixwast bibe şahê miletê xwe, ew hewesdar bû, ku dadgerekî dadmend be. Pêre jî di gundê xwe de nav da, û navdariya wî gîha gundên derdorê, yên ku gelek sitem bi ser nişteciyên wan de jî dihat, û gava wan dadmendî û pendîtiya biryarên wî bihêstin, ji her herêman de çûn ba wî, da nakokiyan wan çareser bike, û pê bawer kirin. Her çû, Medî, ji bo çareserkirina aloziyan, bi piranî diçûn ba wî, bi aqilmendî û dadmendiya biryarên wî piştrast bûn, û bi vî awayî li gel alaoziyên wan pir mijûl dibû.

Demek çû, bi behaneya, ku nikare her tim bi karên xelkê mijûl bibe, û dest ji yên xwe jî ber de, ewî ragihand, ku nema bi tiştekî wan mijûl dibe, û nema li wî cihê, ku lê rûdinişt, û aloziyên hevdijan çareser dikir, rûdine.

Pêre jî careke din dizîn pir bû, û tevlihevî ji berê bêtir bû. Gava alozî û piroblem pir bûn, rêberên Medan bi hevdu şêwirîn, ka divê çi bikin. Gurûpek ji wan bawermendên Deyako bûn, ewana di encûmena şêwrê de ragihandin, ku jiyan gelek giran bûye, û rewş jî her diçe xirabtir dibe, û gotin: a çêtir ew e, ku em şahekî ji xwe re peyda bikin, da karûbarên me bi rê ve bibe, û bi dadmendî hikumdarê welêt be, û aloziyên me çareser bike, û em jî karûbarên xwe bikin, û bi sedema vê tevliheviyê neçare nebin, ku dest ji zevî û çêreyên sewalan berdin. Rêberên din bi boçûna wan qayîl bûn, û hemiyan lihev kirin, ku şahekî peyda bikin, da kar û barê welêt bi rê ve bibe. Navê Deyako hat pêşniyarkirin, ku bibe şahê Medan. Hemiyan pesna wî dan, û pendiyarî û dadmendiya biryarên wî bilind nirxandin, û li hev kirin, ku ew bibe şah, û gava rêkeftin û nerîna xwe gihandin wî, ji wan xwast, ku serayeke, ku layiqî wî ye, jê re ava bikin, û hêza parastina wî jî peyda bikin. Meda ev daxwazên wî pejirandin, serayeke mezin jê re ava kirin, û mafê bijartina hêza xweparastinê jî dan wî, ku wek dixwaze, ji xwe re hilbijêre.

**Damezirandina şahnişîna Med:**

Gava Deyako li ser textê hikumdariyê rûnişt, ji Medan xwast, ku bajarekî mezin ava bikin, hemî ji dêvla gund û bajarokên biçûk, werin di vî bajarî de niştecî bin, û bajar jî bibe paytexta welêt. Medan erê kirin, û bajarê, ku îro bi nave Ekbatana / Ecbatana (Amedan/Hemdan) tê naskirin, ava kirin. Ev bajar di geliyekî zevî dewlemed û dîmen ciwan de hate avakirin, ava berfa, ku li ser tepelên çiyan, diheliya, ew gelî av dida, û cihê ..... 8

# Ji dîroka kovarên Kurdî .... ROJÎ KURD

Edhem Şêxo

Piştî Meşrûtiyeta Duyemîn li dewleta Osmaniyan li sala 1908an, hinek azadî peyda dibû û gelek komele, Kovar û Rojname hatin damazrandin û weşandin, û zana û welatparêzên Kurdan jî firset dîtin ku ji bo xizmetî miletê Kurd, sûdê ji meşrûtiyetê bibînin, û cur bi cur kar bikin wek damazrandina Komeleyan, capkirina pirtûkan û weşandina Kovar û Rojnameyan, û yek ji van Komeleyên Kurdî ku hate damazrandin Komela HÊVÎ ya Xwendevanê Kurd û weşana wê komelayê Kovarek ku bi du zimanan bû – Kurdî û Tirkî – bi navê - Rojî Kurd – li Stenbolê, li 19 heyva Hezîranê sala 1913an derket.

Dema em rûpelên kovara Rojî Kurd dixwînin, gelek mijarên girîng û giranbiha tê de hatine weşandin: wek:

-Rewşa zimanê Kurdî

-Dîroka Kurdî


-Rewşa jinên Kurd

- Rewşa perwerdeya Kurdî

-Çîrok - Helbest - …….hd

Rewşenbîrên ronak û welatparêzên çak di kovarê de mijarên xwe weşandine. Wek: D. Ebdullah Cewdet - Mehmed Mîhrî Hîlav - Ebdulkerîmê Silêmanî - Ebdulezîzê Baban - Fikrî necdet Diyarbekirî - Ekrem Cemîl Paşa - Ismaîl Heqî Babanzade- Mehmed Salih Bedirxan - Mîqdad Mîthet Bedirxan - Neceddîn Huseyin Kerkûkî - Xelîl Xeyalî ……..hd.

Lê dîsa mixabin piştî çar hejmaran, dewleta Osmaniyan biryar derxist û ew kovar qedexa kir. ``Rojî Kurd`` stêrek geş bû di tarîtiya ezmanê Kurdan da bû.




Agahiyên Kovarê:

-Kovarek her heyvekê carekê dertê.

-Firehî û dirêjiya kovarê 18x24 cm.

- Her hejmarek 32 rûpel e.

Di hejmara yekemîn de helbestek hatiye weşandin bi nave – Xwendin û xebat, nîvîsvanê helbestê Fadil Muxlis e, emê çend malikan biweşînin. ………..6

**Ji dîroka Kurdî… Dûmahîk**

wî bajarî jî ji hêla aborî de pir giring bû, ji ber ku li ser riya bazirganiya nevdewletî, ya ku bi navê (riya herîr) tê nasikirin, diket. Bajar di wê newalê de li ser girekî hat avakirin, sûrên bilind û hêzdar bi awayê xelekan li derdora wî hatin avakirin, ew ji heft xelekan bû, her yek ji ya pêşî bilindtir bû, û cihê bajêr ê bilind li gorî vê pilanê bû, û seraya şah û her gencîneyên pê ve giradyî li dawiya bajêr bûn. Kevirên sûra pêşî spî bûn, û yên sûra di pey re reş bûn, û kevirên sûrên din qirmizî û şîn û purtiqalî bûn. Kevirên van her pênc sûran hatibûn boyaxkirin, û kevirên her du sûrên dawî bi rengên zîv û zêr hatibûn boyaxkirin. Deyako ev sûrên hêzdar ji bo parastina xwe û seraya xwe ava kirin, û xelkên din jî xaniyên xwe li dervayî sûran ava kirin.

Piştî ku bajar hat avakirin, Deyako dest bi rêwresmên şahnişînê kir, divê hema kesek jî nêzîk wî nebe, kesê, ku tiştek jê re divê, divê di riya sekretêr û nûçegîhanan re daxwaza xwe bişîne, cihê ku ew lê be, ken û tifûkirin qeqxe ye. Deyako ev tedbîran, ji bo xwe ji rêberên Med ên din biparêze, peyda kirin, çimkê ewana jî hem ji malbatên navdar bûn, û hemî wêrek û leheng bûn.

Piştî ku Deyako bû şah, û zagonên şahnişînê danîn, dest bi karê dewletê kir, refên Medan kirin yek, û rêbaza xwe, ku bi alozî û karên xelkê mijûl dibû, domand, û nakokiyên wan çareser kirin. Deyako bi diqetiyê û qutobiriyê navdar bû, hêzên parastinê li tevaya şahnişînê belav kirin, da haya wî ji pergala gel hebe. Rêwresim ew bû, ku kesê tiştek diviya bû, divê daxwaza xwe nivîskî bo şah bişîne, şah jî dê lê binere, û birayara xwe bide, û eger bibihîsta kesekî li yekî din daye, ferman ew bû, ku wî kesî bînin paytextê, ew dad û seza dikir. Piştî van tedbîran hemiyan, Deyako hêza Med a şervan amade kir, û da ser şahnişîna Aşûr, lê şoreşa wî têk çû, û ew jî dîl ket, û li gel hin şêwirmend û xebatkaran, bo bajarê Hema yê Sûryeyê hat surginkirin, paşê hate vegerandin, û li şahnişîna Aşûr hate zîndankirin, an jî ew kirin dîlê rûniştina neçarî, û li derdora sala (675/674) b.z mir, û kurê wî Xeşaterît /Khshathtrita şûna wî girt.*(dûmahîk li hejmara bê).*

**Hevpeyvîn ... Dûmahîk**

minê dil bi kul û dil tijî keser".

Belê, ez Kurdekî Dersimî, berî tevkujîya Kurd-kesîbên wê herêma Kurdistanê, di Payîza sala 1935'an, gundê ku girêdayîyê qeza nav Mêzgir, liwa nav Moxindî, gundê nav KÛPİK da ji dayîk bûme hatime vê cîhana vala û derewîn ji bo kişandina derd û kulan û kesera Kurdistanek Azad. Di wexta wê tevkujîya barbarî, ez lawikekî biçûk, bav û dayîka min, li tev 4 zarokên xwe -du (2) law û du keç- du sal di şikeft, çet, dal û gelîyan da mane em parastine. Ango ez bermayî yê 70.000 cangorîyên wê tevkujîya barbarî, a Roma reş im li Dersimê. Çîroka jîyana min gelek bi êş û jan û gelek jî dirêj e. Di yanzdeh (11) salîna min da, leşkerên Romê ez bi dara zorê birime dibistanê, ku di wê dem û rojê da min peyvek bi zimanê Tirk jî nedizanbû. Di wê roj û demê da cîhanek min hebû, ku ew cîhana min jî gundê minê nav Kûpik, welatekî min hebû, navê wî welatî jî Kurdistan bû.

Min tenê pênc sal di dibistana dijmin da xwendîye, lê şadetname, ango dîplome ne standîye. Çîroka vê gelşê jî gelek dirêj e, ku min ev gelşa di bîranînên xwe da -bi Tirkî bi Kurdî- dûr û dirêj nivîsîye. Di destpêkê da ez bi xwe bi xwe ra bûme mamoste. Dûra dem û dewran ji bo min hat guhartin, ez li çar Kîşwerên cîhanê gerîyam, bi sedan bûm nasê kesên Zana, Rewşênbîr, Nîvîskar, Sîyasetmedar, şivan û gavan. Min ji her yekî tiştek stand, ewana hemû ji min ra bûn mamoste wekî te, wekî Kek Îsmaîlê dilovan û gorbihişt. Ji bilî we û wan kesan, bê derew, heya roja îro min 2000'î zêdetir pirtûk xwendîye. Kovar, Rojname, di quncên rojnaman da nivîsên nivîskaran jî hesab nakim, lê ez ji xwe ra "Nivîskar, Rewşenbîr, Hozan, Sîyasetmedar" nabêjim, ez şivanekî Kurdistan im, tenê pejn û hestên xwe dirijînim ser kaxiza sipî reş dikim, ku ew kes û Kurdên ku di zanîngeh û enstîtûyan da xwendine, min ji xwe ra bikin mînak. Bi kurtî ez ev mirov im, şivan û xulamekî Kurdistan. Lê eger yek ji min ra "Nivîskar" yan jî "Hozan" bibêje, bê guman dê ez kêfxweş bibim, balam ez ji xwe ra nabêjim.




N-B: *Di wê dema ku xwendevan û nivîskarên bi zimanê Kurdî pir hindik bûn de, çawa û çima zimanê Kurdî bi te şêrîn bûye?.*

R-Ç: Ez bawer im hemû kesên cîhanê zimên wekî şîrê berên dayîka xwe bi tam, wekî şekir û hingiv dihesibînin, hez dikin. Ji ber ku ji dayîka xwe fêr dibin, ku dayîk bi xwe jî Xwedê ye ji bo min. Li milê dî, di jîyana mirovatîyê da, ziman amraz û hacetekî herî girîng e. Mirov bi ziman mirov e. Ziman ku nebe di navbera ajal û mirov da ferq namîne. Ango ez zimên usa dinirxînim. Li milê dî, ziman û zara dayîka min, him jî li ser erdê heft-sed bav û kalên min, ji min ra, ji bi tavahîya Kurdên Bakûrê Kurdistan ra hatibû qedexekirin. Wexta ku ez têgîhîştim vê gelşa qedexe-kirinê û barbarîya dijmin, bêtir ji zimanê dayîka xwe ya nav Kurdistan ve bi tundî hatim girêdan, bûm çirîş bi zara dayîka xwe ve zeliqîyam û li ser kar û xebat kir; ku kok û rîçalên zar û zimanê dayîka min di kûrahîya dîroka bi deh hezar salan ve tê. Ji ber vê yekê ez zimanê dayîka xwe pirr hez dikim, divê herkes jî zimanê dayîka xwe hez bike. Her ziman gulek e, divê mirov wan gulên rengîn neçilmîşîne; her dem kesk û şîn bihêle, bike xasbaxçekî bi hezaran ve reng, wekî kulîlkên çîya û zozanên Kurdistanê. Hêvî dikim hemû Kurd birayên min usa ji zimanê dayîka xwe xwedî derkevin, wekî gulek rengîn û bîhn xweşik, bîhn bikin, roj bi roj jî geş û nûjen.

N-B: *Kek Riza, çi berhemên te yên hatine çapkirin û weşandin û çi destnivîsên te hene? Tu dikarî ji kerema xwe nav, dem û cihê derçûna wan ji me re bêjî?.*

R-Ç: Heya roja îro 23 pirtûkên min hatine çapkirin. Ji van piranî helbest in. 3 Roman bi zimanê dayîkê, bi du zimanan jî -bi Tirkî û Kurdî- ..........

10

**Hevpeyvîn … Dûmahîk**

bîranînên min, pirtûkek jî bi çîrokên gelî, dudu jî bi hin nivîsê minên taybet û bijar, li tev çend pirtûkên helbestan li Stenbolê, di nav weşanên Doz, Pêrî û Vengê da çap bûne; yên din hemû di çapxana Federasyona Komelên Kargerên Kurdistan li Almanya, KOMKAR da çap bûne, hatine weşandim. Niha jî di destê min da romanek û destanek wekî destana evîna Mem û Zînê heye; ango wekî berhevok, ku çapa yekem li Almanya, Komkarê çap kir, îcar vêca jî li tev pêşgotinek nû û direj -bi du zimanan- ez dixwazim çapa duwem li Stenbolê çap bibe. Yek jî dîsa hin nivîsê minên ku di hin rojname û sîteyên Kurdî da derketine, hatine weşandin dixwazim wan jî bikim derpêça sêyem. Ango cîlt.

N-B:*Piştî demeke dirêj ji koçberî û xerîbiyê, sala 2001an te seredana her çar parçeyên welêt kiriye…Gelo wê gera welêt li çi bandor li hest û derûna te kiriye?*

R-Ç: Bira Can, ez di 14'ê Avrêl, ango Nîsanê, 1951'da li welêt derketim, bûm pelgê kerengek hişk, ketim ber ba û bahozek wekî tofan, ba û bahozê ez dam ber xwe, li kevir û kuçan xistim, li ser gaz û tat û çîyayên bilind da derbas kirim, dûra daxistim ser Derya ya cîhanî, a mezin, Pasîfîk Okyanûsa şîn, firandim anîm Cemsera Başûr, Kîşwera nav Awistûralya derxistim; li vir jî gera sê Kîşwerên din ji min ra bû nesîb. Ango xerîbîyek dûr û dirêj û keserek bi êş û jan, ji bo welêt.; lê li tev ken, eşq û kêfê; lê kesera welêt dîsa jî di dil û mêjîyê min da derneket, dê heya roja mirinê jî dernekeve. Wekî ku bav û kalan gotîye “Bilbil kirine qefasa zêr în, wê gotîye ax welat”. Ê min jî usa ye. Belê, heman usa; ez li gundê xwe derketim, yekser min berê xwe da xurbetê, metropolên Roma Reş. Wêstgeha yekem, Edene, a duwem Stenbol, dûra jî cîhan, lê ez nenas û xerîbê welatê dayîk û bavê xwe Kurdistanê bûm. Di sala 2001'î da min biryar stand ku ez herim ew parçeyê ku piştî şerê Kendavê azad bûye bibînim, wî erdê evrar û pîroz maç bikim, bibim nasê hin Kurdperwerên Kurdistan û dûra jî sê parçeyên din. Min wer jî kir, hatim Başûrê biçûk bûm mêvanê te, te û Kek Îsmaîlê cangor, nemir û gorbihişt, we gelek qedra min girt, ji min ra karguzarî kir, we ez gerandim; ji dil gelek-gelek spas. Di destpêkê da, berî ku ez herim parçeyê azad, gotin û tevgerên we, rabûn, rûniştin û zimanê we yê pak, paqij û xweşik bandorek erênî, ango pozîtîf da ser min. Min ji we gelek pejn û hestên Kurdperwerî û gîyanek neteweyî stand. Li parçeyê azad û li Rojhilatê jî serê min gîhîşt asîmanê şîn. Bi taybetî wexta ku ez li parçeyê Azad bûm nasê berrêz Serok Mesûd Barzanî, dîtina hevalê minê hêja, cangor Serokwezîr Samî Abdulrahman û gelek kesên din, hemûyan bandorek Kurdwarî kirin nav mêjîyê serê min û dilê min. Bi taybetî jî şîrîn gotin û tevrara Kek Mesûd Barzanî bandorek taybet da ser gîyan û vîna min. Li vir ez serê xwe li ber gîyana gorbihişt Kek Samî Abdulrahman û hemû cangorîyên Kurdistan ditewînim, ji dil jî, ji we ra, ji rêzdar Kek Mesûd Barzanî ra silavên biratî rêdikim. Li vir, ji bo ku ez berrêz Kek Mesûd Barzanî bibînim, berê min jî wî ra du çarîn nivîsand, bi navçîta berrêz Xelîl Sincarî û Sekretêrê Kek Mesûd, Abdulkerîm Cûma ve gîhand wî Serokê hêja. Li jêr ez ji te ra û ji xwendevanên hêja ra binivîsînim.

**Ez Kurdekî Dersim im, Kurdekî hozan**
**Hatime ku maç kim dergeha Barzan**
**Gelo keys e bibînim te serokê Kurd**
**Ji min ra cihê kê pênc hûrdem zeman.**
**Ji te ra vekim dilê xwe yê bi kul**
**Kesera min ev e wek teyra bilbil**
**Çend roj in li vir im, dilşa, bextewar**
**Ji dijmin dûr im, biran ra mijûl.**

Belê bi van du çarînan ve em bûn nasên hev qasî nîv demjimêr, di qesra wî da.

N-B: *Bêgomane ku civak, wêje û siyaset bi hev ve girêdayî ne. Gelo tu êrîşa teroristên misilmanên hişkbawer li ser gelê Kurd çawa dinirxînî?.*

R-Ç: Newaf Can, berî her tişt divê em ji hev ra rast qise bikin, ji derewan bawer nekin; dûr bisekinin. Gotinek bav û kalan heye; “Masî di sêrî da bîhn dide” dibêjin bira can. Destpêka Ola Îslamê usa destpêbû. ……… 11

**Hevpeyvîn … Dûmahîk**

Ma ew bav û kalê meyên ku di qirne ya heftemîn da dijîyan ji Ol û artêşên Ola Îslamê ra "Ohhhhh hûn bi xêr û silamet ve hatin vî welatê me" gotin? Keko ez naxwazim têkevim kûrahîya vê babetê. Di kûrahîyê vê babetê da bîhnek genî heye, ez naxwazim we ecîz bikim û birûskên nezanan jî bikşînim ser xwe. Ev teror di roja 612'yê mîladî da destpêbû, ev e 1400 salên ku dom dike bavê min, kekê min, lê kor nabînin. Ji kerema xwe Qurana Ola Îslamê bigire dest xwe, rûpelên wê veke, têkeve sure Enfalê ayeta 41'î bixwîne, gelo "XANÎMET" çî ye, malê kê ye? Ango nirxandina vê gelşê ez bawer im gelek kesan biêşîne. Ji ber vê yekê ez naxwazim Kurd birayên xwe biêşînim. Lewra serê sure min pirr pîj, dev jî pirr tûj e. Keko ku heye hêzek, wekî dibêjin "Xwedê" hiş bide gelê Kurd. Gelê Kurd dost û dijmin ji hev qelibandîye, bûye mî ya serî gêj. Keko ev êrîş, ne êrîşa yekemîn e, êrîşa 1400 salan e li ser gelê me yê kesîb û reben.

Ji xwe bîrnekin, me bav û kalên xwe ji bo Erebên çolan ji xwe ra kirin dijmin, em bûn xulamê Ereb, Tirk û Farisên Îslam, jibo bihişta binê erda sar û 70 Horî û Melekên bedew, çav şîn û reş-belek. Gelo kî çûye bihişta bin erda sar û tarî hatîye û gotîye "Li wir ji her Îslamekî ra 70 Horî û Melek hene, di paşila wî da radizin û kaguzarî dikin?.......

N-B: *Li gora ezmûna te bi xebat û jiyanê re ku temenê te nêzîkî 80 salî bûye, tu çi ji keç û lawên xwe yên Kurd re dibêjî?.*

R-Ç: Bira Can, piştî du meh, ango di meha Cotmehê da 81 salên min diqedin, ez dikevim sala 82'yan. Divê hemû keç û lawên Kurd, ên Kurdperwer, di kîjan welatî da dijîn bila bijîn, lê divê ew ji xwe çucar ji bîrnekin ku ew Kurd in; ji zimanê dayîk û bavên xwe xwedî derkevin. Li ku rûdinin, radibin, her dem di nav xwe da bi zimanê dayîka xwe qise bikin û biaxifin. Divê bixwînin, pênûsê ji xwe ra bikin şûr û Atom. Bibin kesên zana, xudan pîşe û huner. Lênûskan jî ji xwe ra bikin Zend Awesta. Li milê dî, divê ew bizanin ku ewana şewq û tîrijên pêşerojan in, her dem jibo yekîtîya biratî kar, dost û dijimên xwe jî ji hev cihê bikin, jibo cîhanek aştî dadmendî hewl bidin, dijê şer û pevçûnan derkevin, ji biçûkan hez bikin, ji mezinan ra jî her dem rêzdar bin. Bi taybetî jî ji dê û bavên xwe ra.

N-B: *Li dawiya vê hevpeyvînê, xewn û hêviyên Rizoyê Dêrsimî Çine?*

R-Ç: Kekê min xewn û demcama min, berê ku ez bimirim dixwazim Kurdistanek Azad û Serbixwe bibînim, ev yek. A duwem jî cîhanek bê şer û pevçûn, cîhanek aştî û cîhanek dadmendî, herkes, ji herkesî ra rêzdar, bira û heval. Ji zarok û hezkirîyên min ra jî hosîya min ev e: Ku ez mirim, divê laşê min were şewitandin, axa laşê min here Kurdistanê, gundê minê Dersimê KÛPİKÊ. Lê ne bi Qurana Erebî û diwayên wê. Ji hemû xwendevanên Newroz ra silavên biratî û Kurdperwerî. Bimînin di xweşîyê da.

-----------------------------

**Riza Çolpanê Dersimî, Sydney. rizacolpan@gmail.com**

Li ser navê Weşana NEWROZ Spas dibêjim, hêviya temenekî dirêj û tenduristiyeke bê kul û êş ji te re dikim û bimînî di xweşiyê de.

11.08.2016 Z

***Têbîn***: *Li ser xwesteka rêzdar **Riza Çolpanê Dêrsimî**, me tu guhertin di hevpeyvîna wî de ne kiriye, weke wî nivîsandiye, em diweşînin, çiku wî xwastiye ku hestên xwe, bi devoka dayika xwe bîne zimên,û em wê xwasteka wî bicih tînin.*



# Farûq Begê Se`îd Begê çû ber dergeha bilind



Li roja çara miha Rezberê, û piştî keftlefteke dirêj bi nexweşiyê re. Farûq Beg cîgirê Mîr Teĥsîn mîrê Êzdiyan li Îraq û cîhanê, û birayê wî yê biçûk, li welatê Aleman temenê xwe kir, û çû ber dergeha nûranî.

Pişt re, darebesta wî anîn Kurdistan, û li navenda mîrîtiya Êzdiyan, li bajarê Ba`edrê hate veşartin. Gelek kesên navdar û payebilind ji hemî qadên civak û layenên siyasî li Herêma Kurdistanê, xelk û bawermendên Êzdî li verêkirina wî amade bûn.

Me gorbuhişt Farûq kurê Se`îd Begê, di seredaneke wî de li Efrînê nas kiri bû. Ew mirovekî zana û çalak bû, rewşa pêgirên ola Êzdî baş dişopand, û seredana wan û navçe û dverên wan dikir, wan jî rêza wî digirt û ciyê hezkirin û rêzdariyê bû.

Mirina Mîr Farûq ji gelê Kurd re bi giştî ziyaneke mezin bû, û bi taybetî ji xelkê me yê Êzdî re.

Bi navê rojnama Newroz em serê Teĥsîn Begê û hemî gelkê Kurd û xelkê me yê Êzdî xweş dikin, û dibêjin bila serê we hemiyan xweş be, û tu êşekên din nebînin.

# Nan ...! Nan...!



Nan ji pêdewîstên bingehîn e li ser sivra malbata Çiyayê Kurmênc. Di malbatên me de nan di ber nên re tê xwarin!. Ango, eger sade goşt li ser sivrê be, û nan tune be, sivre temam nabe û xwarin ne tê xwarin. Ji bilî ku heyîn û endamên pêkhateyên wî yên hundirîn, mada bingehîn e di pêplûka dankirina mirov de. Ji ber wê jî, belkî li seranserî Sûryê, û li dirêjiya dehsalan, buhaya nên, ji hêla dewletê ve pişgir dibû, û bi buhaya hindik digihîşt welatiyan. Piştî ku Rêvebirya Xweser li herêma Efrînê destê xwe ji pişt nanê ku li nanpêjên taybet çêdibe kişand, buhaya kîloya nanê nanpêjên (geştevanî), gihîşt du sed lêre sûrî, ango her nanek bi bîst û pênc lêreyan. Pirs ew e, ma malbatê xizanên wê çawa bikin? Çima, di van rewşên dijwar de, Xweserî buhaya nên bilind dike, û hesabê xelkê nake?!

# Dîsa Komkujî li Hesekî!!



**Li hêvara sisyên miha Mijdarê, têrorîstên hov, xwekujiyek di nava ahengeke zemawendekî de li bajarê Hesekê pêk anîn, û di encamê dora sed kesên sivîl, ji zarok, jin, mêr.. bûn qurbanî. Ev ne cara yekê ye, û ne jî wê ya dawiyê be, ku ew mejiyên kufkî komkujiyê çepel û kirêt dikin, û rûmetê ji giyanê mirovên bêguneh re nagirin..**

**Rûmet ji şehîdên Hesekê re.. çakbûn ji birîndaran re..**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê:**
**Newroz@yek-dem.com**